Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1017 | 27-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Nîgaşên hebûna Kurdî

**Hunermendên hunerê hevçax ên Kurd li Lehistanê beşdarî pêşangeha bi navê "Kurdistan Images of Existence" dibin. Kuratorê pêşangehê dibêje: Ax û welatê xelkê heqîqeta wê civakê nîşan didin. Heger axa meriv tine be, mixabin dê fêkiyên meriv jî tine bin! Bi vî awayî meriv ji ser rûyê erdê winda dibin.**



Dê pêşangeha "Kurdistan Images of Existence" (Wêneyên hebûnê yên Kurdistanê) li "Muzeya Okregowe" 25'ê Mijdarê (yanî îro) destpê bike û wê heta 31'ê Adara sala 2023'yan dewam bike. Li Lehistanê cara ewilî ye ku pêşangeheke wiha berfireh ji bo Kurdan tê lidarxistin. Ji xwe, ev pêşangeh jî di çarçoveya "International Festival of Art of Protons" de tê lidarxistin ku nexasim piştevaniya miletên bê dewlet dike. Antropologê Norwecî, Thomas Eriksen têgîna "Proton" bi pêş xistiye ji bo îfadekirina miletên niştecih ên ku statuyeke wan tine ye. Her wiha ji bo karibin di warê siyasî û çandî de bi pêş bikevin û xebatên dewleteke serbixwe bimeşînin jî ji wan xelkên niştecih hunermend derdikevin û ew berheman diafirînin. Hunermendên Kurd ên beşdarî vê pêşangehê dibin jî nîşaneya vê yekê ne. Pêşangeha bi navê "Kurdistan Images of Existence" weke edîsyona yekem a festîvala "International Festival of Art of Protons" hatiye hazirkirin. Rêveberiya festîvalê da zanîn ku di demên peş de jî, dê ji bo civaka Bask, Katalan, Tîbet û Tataran jî edîsyonên cuda werin hazirkirin û festîval her sal wê bi awayekî dewam bike.

Di pêşangeha "Kurdistan Images of Existence" de ji gelek dsîplînên hunerî, berhem tên nîşandan. Di warê karên plastîk, wêne, film û wêjeyê de pêşangeheke xurt e û afirîneriya hunermendên Kurd nîşanî xelkê dide.




**Bi hêza heqîqetê ditirsînin û hêviyan çêdikin**

Kuratorê pêşangehê û midûrê Muzeya Okregowe, Dr. Waclaw Kuczma got, ew pirr kêfxweş e ku wan ev pêşangeh hazir kiriye. Her wiha ji bo hunermendên Kurd li Lehistanê karibin hunerê xwe nîşan bidin jî derfet ava kirine û pêşangeheke bi rêk û pêk hazir kirine. Dr. Waclaw Kuczma da zanîn ku wî beriya vê xebatê jî çend hunermendên Kurd nas kirine, lê derbarê çand û welatê Kurdan de kêm tişt zanîbûye. Piştî hin çalakiyên ku Kurd li dar dixin, Kurdan ji nêz ve dişopîne û bi vî awayî Kurdan bêhtir nas dike. Ji bo hunermendên Kurd dibêje, "Hunermendên hevçax ên Kurd di huner, film û wêjeya xwe de zimanekî gerdûnî bi kar tînin û vê yekê pirr baş jî pêk tînin. Li festîvalên weke Cannes, Venedîk û Kasselê min pêşangeh û karên wan ên serketî dîtin. Ew bi hêza heqîqetê kesên dijberî xwe ditirsînin. Lê di heman demê de hunerê wan hêviyekê jî ava dike û maneya hebûna civakan nîşanî me dide."

**Ax tinebe fêkî jî çênabin!**

Dr. Waclaw Kuczma ji bo rewşa Kurdan baştir rave bike, mînakeke wiha dide; "Zemanekî Antoine de Saint Exupery jî nivîsandibû û gotibû, 'Rastiya dara portakalê, ew ax e ya ku li ser mezin dibe.' Vêca çand û huner jî hebûna miletekî diyar dikin û dikin ku kesayetên xurt ava bibin. Ev kesayetên xurt li gel her tiştê ne baş jî civaka xwe temsîl dikin. Kurd jî li gel ku neteweke mezin in, dîsa jî ji axa xwe mehrûm in. Ax û welatê xelkê heqîqeta wê civakê nîşan didin. Heger axa meriv tine be, mixabin dê fêkiyên meriv jî tine bin! Bi vî awayî meriv ji ser rûyê erdê winda dibin." *-Ozgurpolîtîka*

# Xwendin riya ku diçe xwenasînê ye

**Jinên ciwan ên serdana 4'emîn Pêşangeha Navnetewî ya Pirtûkan kirin derbarê girîngiya xwendinê de nêrînên xwe parve kirin.**

4'emîn Pêşangeha Navnetewî ya Pirtûkan ku li Silêmanî bi beşdarbûna 20 welatan di 17'ê Mijdarê de destpêkir û didome. Di pêşangeha ku dê heya 27'ê Mijdarê bidome eleqeya jin û ciwanan balê dikşîne. Me derbarê giringiya xwendinê û asta xwendina ciwanan de ji ciwanên ku serdena pêşangehê dikirin pirsîn.

**'Bi riya nivîs û xwendinê jin dikarin xwe zana bikin'**

Besoz Ehmed ku serdena pêşnageha pirtûkan li bajarê Silêmanî kir diyar kir ku ev pêşangeh karek gelek girîng e, ji ber bi vê riyê mirov fêrî zanist û zanyariyên cur be cur dibin û wiha got: "Em weke jin dema pêşangehek civakî tê vekirin divê em biçin serdanê û li pirtûkan binêrin. Divê em bizanibin ku pêwîstiya me bi xwendinê heye. Ya girîng di vê pêşangehê de ew e ku weşanxaneyên biyanî û herêmî tên ba hev ku bi vê yekê xwendekar dikarin zêdetir pirtûkan bi dest bixin, asta xwendinê di qada siyasî, civakî û pirsgirêkên taybet ên jinan de bilind bikin. Tundiya li hemberî jinan di asteke bilind de ye, ev jî çend sedemên wê hene, ji bo pêşî li van sedeman were girtin û civak ber bi pêş ve biçe divê civak bi giştî û bi taybetî jin, bi riya xwendina pirtûkan asta hişyariya xwe bilind bikin, zêdetir binivîsînin û xwe vebêjin."

**'Pirtûk cîhaneke hundirîn ji bo xwendevan diafirînin'**

Jina ciwan a bi navê Jawan Soran destnîşan kir ku pêşangehek bi vî awayî di rewşa niha ya Başûrê Kurdistanê ku di qeyaranan re derbas dibe girîng e. Her wiha diyar kir ku rewşa siyasî ya b aloz herî zêde bandorê li ser jinan dike û got: "Ji ber ku her dem êrîş û tundîtûjî di civaka Kurd de li hemberî jinan heye, ji ber wê jin dikarin bi riya xwendinê der barê mafên xwe de bibin xwedî agahî û zêdetir li hemberî vê tundîtûjiya ku tê kirin hişyar bin. Bandora pirtûkan



di pêşîgirtina tundîtûjiyê de zêde ye, ji ber ku xwendin, fikr û ramanên mirov bi pêş dixe. Bi xwendinê asta hişyariyê zêdetir dibe. Mirov ji xwe û mafên xwe, ji gerdûnê haydar dibe."

**Jin ji bajarên cuda tên serdana pêşangehê**

Ji derveyî bajarê Silêmanî li navçe û bajarên cuda yên Başûrê Kurdistanê hemwelatî serdana pêşangehê dikin û daxwaza wan ew e ku hemû kes werin pêşangehê. Jiyan Hemîd ku ji Dihokê hatiye serdana pêşangehê wiha dibêje: "Girîng e ku jin ew pirtûkan bixwînin, bi taybetî yên li ser pirsgirêka jinan, ji ber ku bi wê yekê hişyar dibin û li hemberî tundîtûjiyê disekinin. Ev jî dibe sedem kêmbûna nêzîkahiyên tund ên li hemberî wan." *-JINHA*

# Ji ber bombebaranên Tirkiye û Îranê ajalên kovî telef dibin

**Ji ber bombebanên Tirkiye û Îranê li sînorên Başûrê Kurdistanê ajal û firindeyên kovî telef dibin. Ev rewş bûye sedema fikara jîngehparêzên Soran û daxwaz dikin ku topbaran û bombebarana van herdu welatan were rawestandin.**

Herçiqas polîsên jîngehe û daristanên Herêma Kurdistanê dixwazin firinde û ajalên kovî ji nêçîrvanan biparêzin, lê vê carê ajal û firinde dibin qurbaniyê topbaran û bombebaranên Îran û Tirkiyeyê. Ev rewş bûye sedema fikara jîngehparêzan.

Jîngehparêz Sîrwan Şêx Hacî ku di heman demê endamê Rêxistina Ware ya Parastina Jîngehê ya li Sorane, diyar kir ku cihê kêfxweşiyê ye firinde û ajalên kovî dibin bi destê xwe berdin, lê ji aliyek din ve bombebaran û topbaranên Tirkiye û Îranê bûye cihê fikarê û salene dehan curê ajal û balindeyan tine dibin.

Jîngehparêz Sîrwan Şêx Hacî diyar ku ev herdu welat dijminê xweza û jîngeha Kurdistanê ne û dixwazin bi her awayî dijmintiyê li gel xelkê Kurdistanê bikin û got: "Roj bi roj bombebarên Tirkiyey û Îranê zêdetir ajal û balindên kovî tine dikin. Daxwazê dikin ev herdu welat bombebaranê rawestîne û êdî jingeha Kurdistanê tine neke."

Berdevkê Polîsên Jîngeh û Daristanan a Soran Emîr Xoşewî li ser mijarê axivî û got: "Sînorê îdareya serbixwe ya Soran herêmek berfireh a çiyayî ye. Destê tîmên me ji bo kontrolkirina nêçîrvaniya ajal û firindeyan nagihe her cihî. Cihê kêfxweşiyê ye dikarîn ajal û firindeyên li herêma xwe biparêzin. Ji aliyê din ve ji ber topbaran û bombebaranên welatên cîran fikarin ku ji ber bi dehan ajal û firindeyên kovî telef dibin. Ji bo tiştek ji destê me nayê."



Berdevkê Polîsên Jîngeh û Daristanan a Soran Emîr Xoşewî diyar kir ku li herêmê wan nikarin ti kesekî ku ajal û firindeyên kovî nêçîr dikin, bigirin û got ku vê rewşê jî ew fikar kirine ku ziyan li gelek ajal û firindeyan bûye. Îdareya serbixwe ya Soran, herêmek çiyayî ye û dikeve sêgoşeya Tirkiye, Îran û Iraqê. Gelek çiyayên wê hene. Herwiha deşt, gir û dolên wê hene. Di warê daristanên xwe ve yên xwezayî, ajal û firindeyên xwe ve dewlimende, lê xetereya bombebaran û topbaranên Îran û Tirkiyeyê li ser wan hene. - ***ROJNEWS***

Sudoku:Pirs 27

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | | | | 6 | 1 | | |
| 8 | 2 | | | | 9 | | | 3 |
| | | | | 4 | 8 | | | |
| 4 | 5 | | | | | 9 | | |
| 6 | 3 | | | 7 | | | 8 | 2 |
| | | 8 | | | | | 4 | 7 |
| | | | 2 | 9 | | | | |
| 5 | | | 4 | | | | 7 | 6 |
| | | 2 | 8 | | | | 9 | 4 |

Sudoku: Bersiv26

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 9 | 6 | 8 | 7 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 3 | 1 | 7 | 9 | 2 | 4 | 8 | 6 | 5 |
| 5 | 4 | 8 | 3 | 1 | 6 | 9 | 7 | 2 |
| 6 | 3 | 1 | 4 | 5 | 9 | 2 | 8 | 7 |
| 9 | 8 | 2 | 7 | 6 | 1 | 5 | 3 | 4 |
| 7 | 5 | 4 | 2 | 8 | 3 | 6 | 1 | 9 |
| 1 | 2 | 3 | 6 | 9 | 7 | 4 | 5 | 8 |
| 4 | 7 | 9 | 5 | 3 | 8 | 1 | 2 | 6 |
| 8 | 6 | 5 | 1 | 4 | 2 | 7 | 9 | 3 |



## Dayîkên Şehîdan yên Efrînê : Tu hêz nikarê Tevgera Azadiyê tune bike

Dayîkên Şehîdan yên Efrînê êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser qadên Paraştinê yên Medya bi tundî Şermezar kirin û gotin, vîna Gerîlayên Azadiyê tu carî têk naçe. *R-5*

## Li dijî êrişên dagîrkeriya Tirkî rewşenbîr û nivîskarên Qamişlo daxuyaniyek dan

Ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, rewşenbîr û nivîskarên bajarê Qamişlo, 26`ê vê heyvê çalakiya nobetê li dar xiştin. ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1017 | 27-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# PKK JI HEMÛ GELÊN BINDEST RE BÛ PÊŞENG

44 sal li ser têkoşîna fedayî ya PKK re derbas bû û îsal bi gelek serketinên din re dikeve sala xwe ya 45'an de. Salvegera damezrandina PKK'ê her sal pîrozbahiya serketinên gelê Kurd e. Ev tekoşîn e bi saya keda Rêber Apo û şehîdên rêya azadiyê, îro gelê Kurd bi hemû gelên azadîxwaz re zêdetir nêzî azadiyê kirin e.



## 'Em ji tang û topên Tirkiyeyê natirsin heta dawiyê berxwedan'

Malbatên şehîdan ên bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji ber bêdengiya Amerîka û Rûsyayê li dijî êrîşên dewleta tirk ên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li pêşiya nûnertiya Rûsyayê çalakî li dar xiştin. ***R-2***

## PJAK: PKK îro bûye pêşengê azadiyê ya gelên bidest

PJAK'ê bi daxuyaniyekê salvegera 44'an a PKK'ê pîroz kir û got; "Gelê Kurd bi saya PKK û Rêber Apo kariye polîtîkayên qirkirinê yên dijmin pûç bike ***R-3***

## QSD'ê bîlançoya 25'ê Mijdarê eşkere kir




QSD'ê diyar kir dewleta Tirk a dagirker di roja şeşemîn a êrîşan de zêdetirî 77 gund, bajarok û navendên sivîlan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bombebaran kir. ***R-3***

## Jinên Qamişlo: wê gelên berxwedêr êrişên dagirkeran têk bibin



Jinên bajarê Qamişlo êrişên dagirkeriya Tirk şermezar kirin û gotin, em ê heta dawiyê li kêleka hêzên xwe yên leşkerî bin û li dijî dagirkeran berxedanê bikin. ***R-2***


TI ÊRIŞ NIKARIN TÊKÇÛYÎN ....
SOZDAR DEMÎR *R-4*


Esas dijminê gelan ....
Memed Serdar *R-5*


2 rojên li Fîsê
Farûk Sakik *R-4*

# Jinên Qamişlo: wê gelên berxwedêr êrişên dagirkeran têk bibin

Jinên bajarê Qamişlo êrişên dagirkeriya Tirk şermezar kirin û gotin, em ê heta dawiyê li kêleka hêzên xwe yên leşkerî bin û li dijî dagirkeran berxedanê bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji destpêka şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve, êriş û bombebaranên dewleta Tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê berdewamin. Tirkiyê rojane bi balafirên xwe yên bê mirov welatiyên herêmê, bi taybet jin û zarokan dike hedef û hewl dide kesayetên pêşengiya vê şoreşê dikin, tine bike. Herî dawî jî ji ber ku dagîrkeriya Tirkî li Herêmên Parastinê yên Medya têk çû û ti çare di destê wê de nema, êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêdetir kir. Rojane bajar û gundewarên li herêmê bê serûber bombebaran dike û hewl dide tirsê bixe nava gel, da ku gel koçber bibe û herêm vala bibe.

Tevî ku êriş bi awayekî giran tê kirin, bertekên gel li ser redkirina van êrîşên berdewam in. Herwiha gelê herêmê ji bo rûbirûbûna êrîşên dagirkeriyê



amadekariyên baş dikin û bi îrade û hêza gelê şoreşgerî li kêleka hêzên leşkerî disekinin û banga xurtkirina têkoşînê dikin.

Derbarê rewşa dawî ya li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û girîngiya xurtkirina têkoşînê li dijî dagîrkeriyê, jinên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û dan zanîn ku ew ê li ser bingehê şerê gelê şoreşgerî amadekariyên xwe bikin û li dijî êrişên dagîrkeriyê bisekinin.

**`Bi awayekî hovane êriş tên kirin`**

Jina bi navê Hêvîn Hesen têkildarî êrişên dawî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê wiha got: "Di van rojan de gelek herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji aliyê balafirên şer yên dagîrkeriya Tirkî ve bi awayekî hovane û sîstematîk hatin bombebarankirin. Herwiha li Şehba, Dêrik, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê û Kobanê bi awayekî hovane êriş tên kirin. Di ancama êrişan de bi dehan welatî û kesên welatparêz tên hedefgirtin. Ev êriş bandorê hem li rewşa herêmê hem jî li aboriya wê dike. Lewra Tirkiyê ne welatiyan tenê saziyên xizmetguzarî û yên girêdayî aboriya herêmê dike hedef. Bi vê yekê Tirkiyê hewl dide binsaziya herêmê têk bibe, hem jî welatparrêzên wê tine bike."

**`Balafir û planên Tirkiyê dawî li hebûna me nayne`**





Hêvîn destnîşan kir ku piştî şikandina dagirkeriyê û pûçkirina hemû planên wê yên li dijî gelên herêmê û gelîlayên azadiyê, êrîşên xwe li ser herêmên Rojava zêde kiriye û axaftina xwe wiha domand: "Bi saya hêza gerîlayên azadiyê û berxwedana gelê şoreşgerî me xeyalên Tirkiyê yên zindîkirina DAIŞ'ê şikandin û me di her carê de armancên wê têk birin. Ji ber ku dagîrkeriya Tirk nikare rû bi rû şçerê me bike balafirên xwe li dijî me daye şuxilandin, lê balafirên û planên wê jî dawî li hebûna me nayne.
"

**`Em ê heta nefesa dawî li ber xwe bidin`**

Hêvîn Hesen di dawiya axaftina xwe de got, Em mirovên aştîxwaz in, ku li azadiyê digerin, lê eger kesek êrîşî me bike mafê me jî heye em li ber xwe bidin û têbikoşin. Îro Tirkiye li dijî me gelek binpêkirinan dike, xaka me dagîr kiriye û zarokên me qetil kiriye. Ji bo wê jî dema em bibînin gelê me bi darê zorê tên qetilkirin em bêdeng namînin û emê heta nefesa dawî li ber xwe bidin.


**`Em gavekê jî paş ve navêjin û dev ji nirxên xwe bernadin`**

Jina bi navê Salha Keleş jî da xuyakirin ku gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ne tiştekî nû ne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Dagîrkeriya Tirlkî bi salan e hewl dide gelên herêmê qir bike û xaka Sûriyê dagîr bike. Bi taybet piştî destpêkirina şoreşê tirkiyê hewldanên xwe yên tinekitina gelê herêmê zêde kiriye. Lê wek welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê, piştî lidarxistina şoreşê me bi hezaran şehîd dan û emê her li ser şopa wan bin, em gavekê jî paş ve navêjin û dev ji nirxên xwe bernadin. Xaka rojava xaka me ye emê li ser xaka xwe bin û têkoşînê dewam bikin. Bi çi awayî be emê parastinê bikin û piştgiriya hêzên leşgerî bikin."

Salha li ser bêdengiya dewletên Navneteweyî wiha got, Dewletên Navneteweyî û mafê Mirovan li hember sûc û kiryarên Tirkiyê yên hovane bêdeng dimînin. Herwiha ev kes naxwazin gelê kurd bibin xwedî maf. Ji bo wê jî em dibêjin; 'kesê li hember kiryarên Tirkiyê bêdeng dimîne, şirîkên kuştina zarokên me e. Lewra ev dewlet piştgiriya Tirkiyê dikin û hewl didin bi riya Tirkiyê kurdan bê çare bihêlin. Herwiha naxwazin projeya Netewa demokratîk ya ku bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan pê ketî, bi ser bikeve. Ji bo wê jî alîkariyê didin Tirkan ku me tine bikin.

**`Em ê parastina destkeftî û nirxên şoreşê bikin`**

Salha Keleş di dawiyê de got, çawa ku şoreşa rojavayê Kurdistanê bi navê jinên Kurd mezin û berfireh bû em jî soza parastina destkeftî û nirxên şoreşê didin. Heta ku em çar parçeyên Kurdistanê azad nebînin emê li qadan bin û doza mafê xwe bikin. Kes ji ber kesekî din parastinê nake. Eger yek bixwe parastinê neke wê ji wateya mirovatiyê dûr bikeve



**Jin Di Qada Perwerdê De Pêşeng e**

**Zozan CIZÎRÎ**

Lêgera rastiyê, rastiya xwe naskirinê, her wisa fikar û hewldana domandina hebûna xwe, çanda xwe, nifşê xwe bi hezar salan e di quncika herî jor a aqilê civakî yê mirov de cihekî girîng girtiye. Ango mirov her hewl daye hebûna xwe ya civakî watedar, binirx bike. Heta roja îro belku gelek ekolên fikrî, zanistî, perwerdeyî yên cur bi cur ji bo vê pêş ketine, lê hêza desteserker a zilamê desthilatdar hemû di nava çerxên xwe de hepis kirine, tenê di nav sînorê berjewendiyên xwe de qismek mecala jiyanbûnê daye wan ekolan. Hêzên dewletdar di bin navê perwerdekirina nifşên nû yên civakê de, sîstema perwerdê ya welatê di bin kontrola xwe de bi hişmendiya baviksalar birêkûpêk kirine. Ew jî tenê ji bo dirêjkirina temenê desthilata xwe ferdê bende afirandine. Ev mijara ku ji gelek aliyan ve nakokiyan dihewîne, kesayeta însan û jiyana mirovahiyê, tevî xwezaya jîngehî ya hemû zindiyan aniye ber hilweşîn û dejenerebûnê. Li vir mijara hîn girîng a hêviyek nû dide, li Rojavayê Kurdistanê asta pêşengiya jinan a di vê qada fikir û perwerdehiyê de ye.

Roja 04'ê Mijdarê li bajarê Hesekê jinên Kurd û Ereb 2. Konferansa xwe ya Meclîsa Perwerdê ya Jinan lidar xistin, xebatên perwerdeya jinan û giştî civakê ya du salên nêz ên bihûrî nirxandin. Weke Meclîsa Perwerdê ya Jin a Bakur-Rojhilatê Sûriyê xwe birêxistinkirin, ji bo avahiya Netewa Demokratîk gaveke nûjen û dîrokî ye. Bi wateya rast, erk û berpirsiyariya perwerdekirina civakê hilgirtine. Adeta wekî nimûneya agirê ku mirovahiyê afirandî û qralên zalim ji bo xwe dizîn, vê carê bi vîna jinê tu wî agirî ji destê wana rizgar dikî û radestî mirovahiyê dikî! Ev gaveke ew çend pîroz û giranbuha ye. Ev berhemeke herî binirx a Şoreşa Rojava ya li ser ked, berdêl û xwîna bi hezaran ciwan, jin, zilam, dayîk û bavên vê herêmê yên berxwedêr-şoreşger afiriye. Heqîqet ev e ku, li tu welatekê yan jî li tu aliyekî cîhanê hêza jin di vê astê de xweser û demokratîk berpirsiyariya pêşengiya pêşxistina civaka xwe negirtiye ser şanê xwe.

Wekî tê zanîn, ji destpêka Şoreşa Rojava ve, ango nêzî 11 salan e jinên Kurd, Ereb, Asûrî-Sûryan di asta herî pêş de xebata perwerdê dimeşînin. Biryarên herî girîng ên têkildarî perwerdeya dibistanan, mamosteyan û giştî jinan destpêkê jin digirin. Di sazkirina sîstema perwerdê ya giştî Rojava de hem di warê hejmar de, hem jî di warê wesf de giraniya jinan xuya ye. Dema em vana tînin ziman, ev nayê wateya ku her tişt çar bi çar bûye, erk tam pêk hatiye. Berevajî, ezmûna di nava van deh salên bihûrî de zanebûn û pêwîstiya pêşxistina perwerdeyeke azad, demokratîk a civakparêz mezin kiriye.

Şoreşa Jinê di vê wateyê de ketiye qonaxekê ku gav paşde nade. Ev perwerdeya ku berî her tiştî hêz û zanebûna têkoşîna li dijî hişmendiya cinsiyetperest pêş dixe, ji tevahî nexweşiyên kesayetî yên lîberal, dejenere, desthilatxwaz re dibe derman. Ev perwerde kesayetê li cewherê wî/wê yê civakî vedigerîne. Kesayeta ji rastiya xwe xerîb ketî û dûr ketî, careke din vedigerîne eslê wî/wê. Li şûna dîroka damezrîna text û tacên desthilatdaran, dîroka civakbûna mirovahiyê derdixe pêş. Lewre her xebat û gaveke di vê qadê de xwediyê nirxeke dîrokî-civakî ye.

Di vê çarçoveyê de Konferansa Meclîsa Perwerdê ya Jin a Bakur-Rojhilatê Sûriyê, ji bo tevahî civaka me û jinan diyariyeke girîng e.

# 'Em ji tang û topên Tirkiyeyê natirsin heta dawiyê berxwedan'

**Malbatên şehîdan ên bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji ber bêdengiya Amerîka û Rûsyayê li dijî êrîşên dewleta tirk ên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li pêşiya nûnertiya Rûsyayê çalakî li dar xistin.**

Dewleta tirk a dagirker ji 19'ê Mijdarê ve binesaziya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevî nexweşxane û dibistanan bi riya balafirên şer bi dijwarî topbaran dike. Îro bi armanca şermezarkirina bêdengiya welatên pêwendîdar û navneteweyî li ser sûcên dewleta tirk ên hovane, dayik û hevjînên şehîdan ên bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li pêşiya nûnertiya Rûsyayê ya li bajarê Qamişloyê çalakî li dar xistin.

**'Em ji tang û topên dewleta tirk natirsin'**

Zîn Emîn ji bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye û yek ji çalakvanan e, dibêje ku ew ji tang û topên dewleta tirk natirsin û wiha dest bi axaftinê kir: "Dewleta Tirk a dagirker ketiye ber nefesa xwe ya dawî, emrê wî jî kêm maye, lewre dixwaze tenê xirabiyan bike. Li seranserî Rojavayê Kurdistanê bêyî ku hêzên leşkerî hedef bigre, êrîşî herêmên me dike. Dewleta tirk dixwaze asayîşa welatê me hilweşîne û îradeya gelê me bişkîne lewma welatiyan dike hedef. Em dibêjin ku em ji tang û topên dewleta tirk natirsin. Me gelek şehîd di ber vê şoreşê de dane, qelenê azadiyê gelek buha ye. Berxwedan jiyan e û em ê heta dawiyê li ber xwe bidin."

Zîn Emîn destnîşan kir ku dewletên navneteweyî berovajî prensîbên mirovî tevdigerin û wiha pêde çû: "Hêviyên me ji dewletên navneteweyî şikestine, dewletên navnetweyî dibêjin ku em ji bo mirovan têdikoşin lê berovajî vê yekê li ser rûyê erdê xuya dike. Ev pênc roj in dewleta tirk binesaziya herêmên me bi giranî topbaran dike tevî nexweşxane û dibistanan."

**'Em bang li dewletan nakin, pişta me gelê me ye'**

Zîn Emîn diyar kir ku dê bang li welatan nekin her wiha teqez kir ku pişta wan gelê wan e û wiha bi dawî kir:





'Bila gelê me yê Kurdistanê bêdeng nemîne li hemberî van êrîşan, ev dema hebûn û tunebûnê ye ji bo me wekî Kurd. Bila gelê me li her çar aliyên Kurdistanê xwedî helwest be û piştgiriya gelê Rojava bikin. Em bang li tu welatî nakin, em dizanin ku tiştekî ji bo gelê ma nakin, pişta me û hêviyên me gelê me yê berxwedêr e. Encax bi dostên xwe yên welatparêz û berxwedaniya 44 salan em ê bi ser bikevin û ji bilî vê yekê em tu rê ji xwe re hilnabijêrin." ***JÎNHA***



# 'Em ê her tim perwerdeyên govendê bidomînin'

Mamosteya perwerdeya govendê Mizgîn Tûmak diyar kir em ji hemû pîrozbahiyan re amade ne û bal kişand ser vî tiştî ku şagirtên wan ji ber di 27'ê Mijdarê de wê derkevin ser dikê gelekî bi kelecan in.

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr), ji ber nêzbûna 27'ê Mijdarê bi awayek bi kelecan amadekariyên pîrozbahiyê tê kirin. Her wiha yek ji amadekariyên herî girîng jî, di warê perwerdehiya govendê de tê kirin. Mizgîn Tûmak a endama NÇHM'ê (Navenda Çand û Hunerê ya Mexmûrê) ku di bin sîwana Navenda Çandê de perwerdeya govendê dide zarokan, têkildarî kar û xebat û amadekariyên xwe yên ji bo 27'ê Mijdarê, ji ANF'ê re axivî.

Tûmak diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe û heta niha pir ji govendê hez dike û got: "Ev ev qasî 3-4 sal in, ez perwerdeya govendê didim û ez bi xwe jî 5 caran ketime nav koma govendê. Ez nêzî 30, 40 govendan dizanim. Min her tim pir dixwest ku hem tevlî nav komên govendê bibim û hem jî perwerdeya wê bidim. Ez niha bi fêrkirina govendê pir bi keyfxweş û kelecan im."

**'EM JI HEMÛ PÎROZBAHIYAN RE AMADE NE'**

Tûmak ragihand ku ev koma perwerdeyê bi taybet ji bo 27'ê Mijdarê tê amadekirin û wiha pêde çû: "Her wiha ne tenê ji bo 27'ê Mijdarê, ji bo 8'ê Adarê, 4'ê Nîsanê û çi pîrozbahî hebe, em ji bo wê amade ne. Em ê her tim perwerdeya ji bo komên govendê, bidomînin. Me navê koma xwe kiriye; Şehîd Devrîm. Ev sê meh in me dest bi vê perwerdekirina vê komê kiriye û em niha perwerdeya 5 govendan didin. Tiliyanê heye û ew jî em bes du gavî dilîzin. Yek Elo dîno ya herêma Çelê heye. Yek Ehmet beg e. Yek jî 'De girêde destmal û kiras e' ku me nû derxistiye û ya herî dawî jî Şêxaniya Hekariyan e'."

**'ŞAGIRTÊN ME JI BER NÊZBÛNA 27'Ê MIJDARÊ PIR BI KELECAN IN'**

Tûmak destnîşan kir ku ji roja perwerde destpê kirî û hetanî roja îro, kar û xebatên wan baş derbas dibe û wiha bilêv kir: "Her wiha ji ber nêzbûna 27'ê Mijdarê, di van demên dawî em gelek giranî didin ser dayîna perwerdeyê û em her roj ser hev perwerdehiyê didin. Çi qasî



ku em bikarin, em ê timî perwerdeya xwe ya govendê bidomînin. Şagirtên me ji ber nêzbûna 27'ê Mijdarê û derketina ser dikê, pir keyfxweş û kelecan in û her rojê ji bo amadekirina cil û bergên ku wê pê derkevin ser dikê, pirsan dikin."

Her wiha Tûmak di dawiya axaftina xwe de got ku divê zarokên din jî yên wargehê bên tevlî perwerdeya govendê bibin û destnîşan kir ku ew ji bo perwerdedayînê her tim amade ne.

***-ANF***

# Xema sînemaya 'întelektuel' û 'polîtîk'

**Jean-Marie Straub û Daniele Huillet di filmên xwe de ji bilî estetîkê, xwe ji bo etîkê jî diêşandin. Meriv dikare sînemaya wan weke "sînemayeke întelektuel" jî bibîne û binirxîne. Ji ber ku ew weke du kesên rewşenbîr li ser bingehê sînemayê û her wiha siberoja wê jî difikirîn.**



Dîroka sînemayê (helbet heger di 120 salan de ji bo formeke hunerî afirandina dîrokekê guncaw be û meriv karibe behsa dîroka wî hunerî bike) bi saya derhênerên dilawer û afirîner ava bû. Bêyî van derhêneran meriv nikare behsa dîroka sînemayê bike. Ji lewma, ev derhêner bûn yên ku asoyên têgihîştina sînemayê wêdetir birin û kirasekî hunerî li forma sînemayê fesilandin. Meriv dikare van derhêneran weke "author" jî binirxîne. Peyva "author" li gelek deveran di maneya "nivîskar" û "afirîner" de tê bikaranîn. Di sînemayê de jî nexasim îşaret bi rêgez û şêweyê "afirîner" yê derhênerekî/ê dike.

Di sînemayê de hin derhêner ji rêgezên berê bêhtir, rêgezên nû peyda kirin û li gorî van rêgezan, filmên xwe çêkirin. Yanî wan bi şêwazeke resen ya ku ew hêla wan ya afirîneriyê nîşan dida dîmenên filmên xwe girtin. Meriv dikare weke nimûne gelek derhêneran nîşan bide. Bêguman yek ji van derhêneran Jean-Luc Godard bû. Godard beriya du mehan jiyana xwe ji dest da. Piştî Godard sînemagerê bi navê Jean-Marie Straub jî di 89 saliya xwe de ji vê dinyaya gewrik bar kir. Straub û Godard ji bilî hevnasînê, di heman şiverêya sînemayê de dimeşiyan û her du jî bi tercîhên xwe yên wêrek dihatin naskirin. Her wiha ew li ber hişmendiya Hollywoodê jî radibûn û di sînemayê de nihêrînên azad û serbixwe ava dikirin. Her çiqas kêm kes Jean-Marie Straub binasin û ji sînemaya wî haydar bin jî, ew derhênerekî şareza û "author" bû. Di temenê xwe de û temenê wî hema bibêje weke yê dîroka sînemayê ye, wî gelek film çêkirin û bû parçeyekî bi qîmet yê dîroka sînemayê.

Dema meriv behsa Jean-Marie Straub kir, nabe ku meriv hevjîn û hevrêya wî Daniele Huillet ji bîr bike. Ji lewma bi qasî Jean-Marie Straub ew jî afirîner bû û filmên ku wan çêdikirin hemû, wan ew bi hev re hazir dikirin. Wan di sala 1954'an de, dema şagirt bûn hev du nas kir û salên dirêj bi hev re li ser sînemayê axivîn, ponijîn û film çêkirin. Daniele Huilletê jî di sala 2006'an de wefat kir.

**Ji bo neçe leşkeriyê ji Fransa direve**

Serê ewilî, Jean-Marie Straub û Daniele Huilletê bi hev re çend kurtefilman çêdikin. Straub ji bo jiyan û hunerê Bach bêhtir nas bike, li ser karên wî sê salan dixebite. Piştî sê salan, senaryoya bi navê "Chronicle of Anna Magdalena Bach" dinivîse û vê senaryoyê nîşanî derhêner Robert Bresson dide da ku ew derhêneriya filmê bike. Lê Bresson wiha bersivê dide wan, "Hûn hevalên min ên çak in, lê ev mijara we ye, divê hûn bi xwe vê filmê çêkin." Di sala 1958'an de Fransa gazî Jean-Marie Straub dike da ku biçe leşkeriyê û li hemberî Cezayîrê şer bike. Lê Straub li ber şer radibe û alîgirê şervanên Cezayîrê ye. Ji bo ku neçe leşkeriyê, neçar dimîne derkeve derveyî Fransayê û bi vî awayî tevî Daniele Huillet diçe Elmanyayê û li wir bi cih dibe. Ew yekem filma xwe ya metrajedirêj jî, yanî filma "Chronicle of Anna Magdalena Bach" sala 1967'an çêdikin. Wan sala 1963'an jî kurteçîrokeke Heinrich Boll, bi navê " Machorka-Muff" kire kurtefilmek û ev jî filma wan a yekem bû. Wan filmên xwe bêhtir li Elmanya û Îtalyayê çêkirin.

**Şêwaza polîtîk a filmçêkirinê**

Jean-Marie Straub û Daniele





Huillet di filmên xwe de ji bilî estetîkê, xwe ji bo etîkê jî diêşandin. Meriv dikare sînemaya wan weke "sînemayeke întelektuel" jî bibîne û binirxîne. Ji ber ku ew weke du kesên rewşenbîr li ser bingehê sînemayê û her wiha siberoja wê jî difikirîn. Bi filmên xwe "sînemaya polîtîk" ji nû ve şirove kirin. Ew di heman demê de du Marksîstên netebitî bûn jî. Yanî wan dema filmek çêdikir, tenê li hêla filmê ya estetîk nedifikirîn, her wiha ew li teoriyên din jî difikirîn û temsîlên mekanîzmayên pîşesaziya çandî, dûrî sînematografiya xwe digirtin. Tişta herî giring jî şêwaza çêkirina filmên wan bi xwe "polîtîk" bû. Ji bilî naverokê û senaryoyê, di hêla teknîkê de jî ew li polîtîkaya dîmenekî difikirinê hizirîn û wan awayên nû ceribandin ji bo vê yekê.

***Ozgurpolitika***

# ‘Em ê bi ruh û can Kobanê biparêzin’

Jinên ji bajarê Kobanê hêrs û bertekên xwe yên li hemberî êrîşên dewleta tirk anîn ziman û wiha gotin: “Em ji serkeftina xwe bawer in, bi taybetî weke jin em ê destkeftî û welatê xwe biparêzin, em ê pêşengiya serkeftinê jî bikin.”

Dewleta tirk piştî demeke dirêj ji gefên êrîşeke nû li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, di şeva 19`ê Mijdarê de dest bi êrîşeke berfereh li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir. Dewleta tirk êrîşan bi riya balafirên şer, ên bê mirov, tang û obîsan pêk tîne. Tevî topbaranên bênavber niştecihên herêmê di malên xwe de ne û parastina warê xwe tînin ziman. Ajansa me di nava niştecihên Kobanê de geriya ew jî hestên xwe yên berxwedan, helwest û hêrsa li hember êrîşan anîn ziman.

**‘Mirin carek e bila di warê me de be’**

Zeyneb Zêdan ku mala wê li nêzî girê Miştenûrê ye û gelek caran ji aliyê balafirên şer ve hat topbarankirin, nêrîna xwe wiha anî ziman: “Dewleta tirk dijminekî xedar e û em rastiya wê dizanin. Ji ber vê em di vê zivistanê de ji malên xwe dernakevin, mirin carekê tê û bila vê carê jî di axa me de be. Çar zarokên min hene, her yek ji wan di eniyekê de ye. Ma ez zarokên xwe bi tenê dihêlim ku li hemberî van dagirkeran şer bikin. Ne zarokên min bin jî dîsa ez terka mal, ax û welatê xwe nakim. Pişta me jî xurt e, bi hezaran leşker û şervanên me hene ku dikarin ji bo me canê xwe feda bikin. Em hêza xwe ji dîwarê dijmin nagirin, bila ev ji wan re xewn be. Ji roja yekê ya topbaranê em di mala xwe de ne û tobe be ku em tirsiyan ango ji cihê xwe liviyan. Em ji mirinê mezintir in, ka bila Erdogan bê balafirên şer êrîş bike. Ew dizane ku nikare li hember me şer bike ji lewre ew rêbazên qirêj di van êrîşan de bi kar tîne.”

**‘Emê axa xwe biparêzin’**

Rebia Hisên bal kişand ser bihaneyên ku dewleta tirk di êrîşên xwe de bi kar tîne û got: “Em napirsin Tirk ji me çi dixwazin, ji ber em dizanin ku ew dixwaze welatê me dagir bike û me qir bike. Em dibînin dewleta tirk bi taybetî gefan li Kobanê dixwe. Erdogan bi sedan çete şandin Kobanê da ku vî bajarî dagir bikin lê nikaribûn. Ji ber vê ew niha bi artêşa xwe êrîş dike, em jî li hember van polîtîkayan hişyar in. Em bi welatê xwe ve girêdayî ne, ev ax bi xwîna sedan keç û xortên me rizgar bû. Ji bo vê ev ax li cem pîroz e û em ê tu carî dest jê bernedin. Erdogan dibêje ku ew terorîstan hedef digre, ma ev kes kî ne gelo. Ew zarokên me ne, şervanên YPJ`ê,YPG`ê û QSD`ê ne ku parastina gel û welatê xwe dikin. Erdogan terorîstê mezin e ku îro bi bihaneyên cur be cur me topbaran dike. Em di berxwedana xwe de bi îsrar in, em ê vê axê bi rih û canê xwe biparêzin.”

**‘Em ê pêşengiya serkeftinê bikin’**

Evîn Berewad destnîşan kir ku ewê weke jin parastina destkeftiyên xwe bikin û wiha axivî: “Em weke jinên Kobanê berxwedana şervan û gelê xwe silav dikin. Bertekên me yên li hemberî êrîşan diyar in, em tu gavan ji vir û şûn de navêjin.



Jixwe di navbera dewleta tirk û têkçûnê de tayek maye, ji ber vê ew dixwaze bi van êrîşan xwe bi hêz bike û baweriya gel bi xwe bîne. Bi taybetî helwesta me jinan cudatir e, em tu caran qebûl nakin ku kes dest bavêje destkeftiyên me. Me pêşengiya şoreşê kir, me di berxwedana Kobanê de roleke diyarker lîst û em ji bo tevahî jin û gelên cîhanê bûn hêviya serkeftin û azadiyê. Ev pêvajo ji bo me ya hebûn û tûnebûnê ye, em jî li gor vê girîngiyê tev digerin. Ev êrîş me tune nakin, em ê weke gelê Kobanê li hember êrîşan li ber xwe bidin û tu carî axa xwe bernedin. Wê çarenûsa dewleta tirk weke ya DAIŞ`ê be.”

***JÎNHA***

# Mêhtinger pêjgehê jî dimijin!

**Şefê xwarinên xwecihî, Sean Sheran li Emerîkayê ji bo xwarin û vexwarinên xwecihî yên gelên xwecihî yên Emerîkayê neyên jibîrkirin, restoranteke xwarinên xwecihên Emerîkayê vedike. Ew ji bilî vî karî, pirtûkekê jî dinivîse û tê de behsa çanda xwarinên çermsoran dike. Ji lewma mêhtingeran pêjgeha gelên xwecihî jî daye jibîrikirin!**

Dema behsa mêhtingeriyê tê kirin nexasim çand, ziman û rêrûsmên civakan tên bîra mirov. Weke ku ji xeynî wan ti tişt nayê mêhtin. Lê mêhtingerî pergalake dijwar e, ew reseniya her tişta li ser axekê xera dike û tiştên aîdê xwe li wê axê bi cih dike. Li Dakotaya Başûr, şefê midbexa gelên xwecihî, Sean Sheran ê eşîra “Oglala Lakota”, bi bîr dixe ku mêhtinger her wiha xwarin û vexwarinên gelên xwecihî jî guhertine û niha kêm xwarinên gelên xwecihî yên berê mane. Aşpêj û şefê xwarinê, Sean Sharan hewl dide van xwarinan nede jibîrikirin û ji lewma heta jê tê li pêjgeha xwe xwarinên gelên xwecihî çêdike.



Sean Sheran dizane ku ev xwarin di bin tehlûkeyê de ne.

Dema Sean Sheran ciwan e, li gelek restorantan û her wiha loqenteyan dixebite. Wî kariyereke pirr baş jî bi dest xistiye. Lê dema bala xwe dide xwarinên restorantan, dibîne ku xwarinên gelên xwecihî qet tine ne. Ev yek weke kesekî ji miletên xwecihî yên bakurê Emerîkayê, wî gelekî diêşîne. Jixwe, ew jî heta hingê, bi kêm terîfên çêkirina xwarinên gelên xwecihî dizane û di destê wî de derbarê xwarinên gelên xwecihî de jî agahiyên lazim tine ne. Dema ku ew hîna ciwan e, li Black Hills a li Dakotaya Başûr, dixebite. Ji bo “Xizmeta Daristanên DYE´yê” dixebite. Li wir peywirekê didinê û dibêjin, navê nebatên cuda fêr bibe û her wiha taybetmendiya van nebatan çi ye binivîse. Dema ew dest bi xebata xwe dike û li çavkaniyan dikole, gelek tiştên nû hîn dibe. Ev yek meraqa wî ya derbarê xwarinên gelên xwecihî de bêhtir geş dike.

**Xwarin û vexwarinên gelên xwecihî dide nasîn**

Sean Sheran dixwest vê rewşê biguherîne û bike ku xelk hay ji xwarin û vexwarinên gelên xwecihî hebin. Di çanda gelên xwecihî de a rast ev agahî ji nifşên nû re dihatin zelalkirin da ku hay ji rabuhiriya xwe hebin. Lê kesî ji Sean Sheran re behsa xwarin û vexwarinan nekiribû. Li Emerîkayê bi destê hikûmetê û bi riya “Commodity Food Program” ku bernameyeke ji bo xwarin û vexwarinê ye, xwarin û vexwarin dê çawa werin çêkirin, tê diyarkirin. Lê di nav van de mixabin xwarinên gelên xwecihî tine ne û yên hene jî bêhtir nimûneyên “fastfood” in. Ji ber van sedeman, wî şirketa xwe ya bi navê “The Sioux Chef” ava kir û bi îlhama ku ew ê xwarinên gelên xwecihî bide zanîn û nasîn, dest bi xebatê kir.

**Xwarinên xwezayî çedike**

Sean Sheran, pêjgeheke serbixwe ava dike, yeke welê ya ku di bin tesîra xwarin û vexwarinên Emerîkî yên modern de namîne. Li vê pêjgeha wî, bêhtir xwarinên gelên xwecihî hene. Wî arvan, qamişê şekir, goştê golik û berazan û her wiha yên mirîşkan ji menuya xwe derxistiye! Sherman dibêje, “Em dikarin bi birincê kovî, şîlan û hin nebatên din xwarinên xwezayî çêkin. Her wiha hin heywanên li xwazeyê jî meriv dikare goştê wan bixwe, weke kîvroşkên kovî. Heger hûn li nav daristanê bigerin û baş li hawirdora xwe binihêrin, hûn ê gelek tiştên xwezayî bibînin ji bo xwarinê.” Helbet dema ew van xwarinan li pêjgeha xwe çêdike, teknîkên berê yên gelên xwecihî bi kar naîne, berevajî vê yekê, bi awayekî modern vî karî dike û ji bo vê yekê jî dibêje, “Em wek salên 1941’ê bi teknîkên kevn xwarinê çênakin. Em ne muzexane û parçeyekî muzexaneyê ne. Em xwarinên ku bav û kalên me ji mêj ve çêkirine, bi awayekî modern çêdikin û li gorî hin pîvanên dinyayê ku niha li pêjgahan pêk tên, xwarinên xwe çêdikin. Em dixwazin bi vî awayî çanda gelên xwecihî vejînin û nedin jibîrkirin. Armanca me ji vî karî ev e.”-

***Ozgurpolitika***



# Li dijî êrişên dagîrkeriya Tirkî rewşenbîr û nivîskarên Qamişlo daxuyaniyek dan

Ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, rewşenbîr û nivîskarên bajarê Qamişlo, 26`ê vê heyvê çalakiya nobetê li dar xistin.

**Rojbîn Zagros/Qamişlo**



Çalakiya nobetê li pêşiya navenda giştî ya Netewên Yekbûyî ya li kolana Siyahî ya bajarê Qamişlo pêk hat.

Di çalakiyê de rewşenbîran nameyek vekirî ji Civaka Navneteweyî re şandin û tê de gef û êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker hatin şermezarkirin.

Name ji aliyê nivîskara bi navê Şepal Seîd Yûsif hat xwendin û tê de hat gotin; “Wek komek nivîskar û rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê û bakurê rojhilatê Sûriyê, em êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li ser herêmên me û yên ewle û yên ku binesaziyên herêmên me wek (avahiyên tenduristiyê, deboyê genim, saziyên enerjiyê, av û saziyên din yên xizmetguzariyê) dikin hedef şermezar dikin. Herwiha ji bilê sazî û navendên herêmî, bi dehan mirovên bêguneh jiyana xwe ji dest dan. Gelê me heta niha di têkoşîna li dijî terorê li ber xwe dide û serkeftî ye. Jixwe armanca sereke ya dagîrkeriya Tirkî têkoşîna li dijî hebûn û nasnameya kurda li herêmê ye. Ji bo wê jî em bang li civaka navneteweyî dikin ku bi tundî li dijî van êrişan bisekinin û zextê li dagîrkeriya tirkî bikin ku êrişên xwe rawestîne. Lewra rojane welatiên herêmê ji ber êrişên dagîrkeriyê şehîd dikevin û birîndar jî çêdibin.”

Herwiha rewşenbîr û nivîskaran pankartên bi zimanê Îngilîzî yên `Terora Tirkî bidin sekinandin, me nekujin, em dixwazin di nava aştiyê de bijîn, ji bîr nekin ku Kurdan mirovahiyê parastiye, Kurdan biparêzin` rakiribûn.

# Li dijî êrişên dagîrkeriya Tirkî rewşenbîr û nivîskarên Qamişlo daxuyaniyek dan

**Navenda Nûçeyan**

**QSD’ê diyar kir dewleta Tirk a dagirker di roja şeşemîn a êrişan de zêdetirî 77 gund, bajarok û navendên sivîlan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bombebaran kir.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD’ê li ser malpera xwe bîlançoya êrişên artêşa Tirk a dagirker ragihand.

QSD’ê diyar kir ku şikestina dewleta dagirker a Tirk ji encamên binkeftî yên êrişên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê eşkere bûye û got: “Dagirkeriya Tirk ji ber binketinê êrişên xwe bi awayekî hovane û derveyî pîvanan li ser deverên sivîl û jêrxaneya xizmetguzariyê berdewam dike. Gelê me li hemberî van êrîşan berxwedana xwe mezintir dike û em jî mafê xwe yê parastina rewa bi cih tînin”.

QSD’ê da xuyakirin ku di roja şeşemîn a êrişan de dagirkeriyê zêdetirî 77 gund, bajarok û navendên sivîlan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bombebaran kir. Herwiha da xuyakirin ku di heman demê de komeke çeteyan di bin gera balafirên keşfê de hewl da êrişî herêma Zirganê bikin û hêzên wan li çeteyan dan û 6 çete hatin kuştin.

Li gorî QSD’ encama êrişên dagirkeriyê yên saetên dawîn ên roja pêncşemê 24’ê Mijdarê û her wiha encamên roja înê 25’ê Mijdarê ev in:

**24’ê Mijdarê**

Eniya Zirgan bi 8 obus û 6 hewanan hat topbarankirin. Li gundê Bobê hewldana êrişa çeteyan hat têkbirin. Di pêvçûnê de 2 çete hatin kuştin. Piştî pêvçûnê çalakiyeke bi çekên giran li hember çeteyan hat lidarxistin. Di encama vê çalakiyê de jî 4 çete hatin kuştin. Bi giştî 6 çete hatin kuştin.

**Qamişlo**

Gundên Zorava, Xiwêtla, Mele Ebas, Şelûmiyê bi 7 obusan hatin topbarankirin.

**Til Temir**

Gundên Tewîla û Gozeliyê bi 14 obusan hatin topbarankirin.

**Kobanê**

Gundên Cîşan, Goran, Xirbîsan, Zorava, Til Ehmed Mûnîr bi 11 hewan, 2 guleyên tankan hatin topbarankirin.

**Girê Spî:**

Gundên Tepê Xan, Xalidiyê û gaziya Terad bi obus û tankan hatin topbarankirin.

**Eyn Îsa - Tirwaziye**

Bajarokên Um El Beramîl bi 3 obusan hat topbarankirin.

**Minbic:**

Gundên Elyanlî, Korheyuk, Ewn Dadat, Hoşeriye, Boxaz û Seyada bi 18 hewan û 5 obusan hatin topbarankirin.

**25’ê Mijdarê**

**HERÊMA EFRÎNÊ**

Gundên Samûqa, Til Ziwan, Til Madiq, Til Cîcan, Im Hûş, Minnix, Eyn Deqnê, Nêrebiye, Bêluniye, Dêrcimel, Şêx Îsa, Girê Meyasê, Merenaz, Şewerqa, Malikiye, Soxaneke, Qinêtirê, Girê Bênê, Tatmaraş, Tinnib, Elqemiyê, Îrşadiyê û bajarokê Til Rifat bi 406 obus, 39 hewan, 350 bombeyên bombeavêjan hatin topbarankirin.

**Til Temir**

Gundên Dirdara, Til Tewîl û Tewîla bi obusan hatin topbarankirin.

**Hol**

Li Kampa Holê hemwextî gera balafirên keşfê yên Tirk, komek çete reviyan û piştî demek kurt ji aliyê hêzên me ve hatin girtin.

**Kobanê**

Gundên Zormexar, Cîşan, Goran, Xirbîsan, Ziyaret, Qeremox, Til Şeyîr, Siftek, Kor Elî, Çarixlî, Xerab Eto Girê Miştenur û bajaroka Şiyux Foqanî bi obus û hewanan hatin topbarankirin.

**Girê Spî**

Gundên Huşan, Seyda, Ebdokê, Ebû Kurdo, Dibis, Koberlik, Îbrahîm Kurdî û rêya M4 a navneteweyî bi obus û hewanan hatin topbarankirin.

**Eyn îsa**

Gundê Siwêdiya bi 5 obusan hat topbarankirin.

**Minbic**

Çiyayê Hemam, gundên Hoşeriye, El Cat, Korheyuk, Seyda, Ewn Dadat, El Yanelî bi 15 hewan û 12 obusan hatin topbarankirin.”

# PJAK: PKK îro bûye pêşengê azadiyê ya gelên bidest

**Navenda Nûçeyan**

**PJAK’ê bi daxuyaniyekê salvegera 44’an a PKK’ê pîroz kir û got; “Gelê Kurd bi saya PKK û Rêber Apo kariye polîtîkayên qirkirinê yên dijmin pûç bike**

Bi wesîleya salvgera 44’an ya damezrandina PKK, Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) daxuyaniyek niviskî weşand.

PJAK di daxuyaniya xwe de diyar kir ku gelê Kurd bi saya PKK û Rêber Apo kariye polîtîkayên qirkirinê yên dijmin pûç bike û bi biryardariyeke xurt di rêya azadî û demokrasiyê de bimeşe û wiha got: “Gelê Kurd ku di nava lepên qirkirina herî mezin a dijmin de bû, îro bûye pêşengê têkoşîna azadiyê ya gelên bindest û rêya têkoşîna gelên bindest ên Rojhilata Navîn ji berê zêdetir vekiriye. Têkoşîna PKK’ê îspat kir ku gelên herêmê li dijî moderníteya kapîtalîst polîtîkaya moderníteya demokratîk heq dikin û bi yekîtî û hevgirtinê dikarin di rêya dijwar a azadiyê de ber bi armanca xwe ve bimeşin.”

PJAK da xuyakirin ku di pêvajoya heyî de hemû gelên Rojhilata Navîn di hemû qadan de ji encamên pêngavên PKK’ê û Rêber Apo sûd werdigirin û her kes şahidê destketiyên wê yên erênî û bandorker ên li ser tevgerên rizgariya herêmê ye . KJK wiha dewam kir: “Gel û civakên ku ji aliyê pergala kapîtalîst ve hatibûn ber asta têkçûnê, îro bi saya têkoşîna gerîla bûne xwediyê hêviya vejîna rêya azadîxwazî û demokratîkbûnê. Ji têkçûna DAÎŞ’ê heta têkoşîna li dijî faşîzma Tirk, fedayiyên gelê Kurd ên di pêşengiya Rêber Apo de bûne mînakek watedar a rêya têkoşînê. Di qonaxa niha de karwanê vê têkoşînê li Îranê jî bi bandor bûye û pêşengên karwanan jinên bi xîret û têkoşer in.”

PJAK da zanîn ku ji Îmraliyê bigire heta her çar aliyên Kurdistanê gel li dijî faşîzm û zilma dijmin, hêza xwe ji têkoşîna bêhempa ya Rêber Apo digire. Her wiha dostên gelê Kurd ên enternasyonalîst ên li çar aliyên cîhanê ji rewşenbîran bigire heta akademîsyen û jinên azadîxwaz piştgirî didin Rêber Apo û tevgera azadiya Kurd û di mafdarbûna têkoşîna gelê me de israr dikin û wiha dewam kir : “Azadiya gelê Kurd li Rojhilata Navîn tê wateya azadiya hemû gelên bindest; bi saya têkoşîna bê hempa ya gelê me yê welatparêz, rêya pêkanîna azadî û demokrasiyê vebûye û em nêzî azadiyê bûne.”

# PKK: Berxwedana azadiyê bilind bikin

Komîteya Navendî ya PKK'ê bi wesîleya salvegera 44'emîn a avakirina PKK'ê banga mezinkirina berxwedana azadiyê ya li hemû qadan kir û got, em bang li hemû gelê xwe û dostên xwe dikin ku li dora berxwedana gerîla bibin yek.

Navenda Nûçeyan

**Bi wesîleya 27'ê Mijdarê salvegera 44'emîn ya avbûna Partiya Kerkerên Kurdistan PKK, Komîteya Navendî ya PKK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand.**



PKK'ê di daxuyaniya xwe 27'ê Mijdarê Vejîna Neteweyî û Cejna Partiyê li Rêber Apo li hemû hevrêyan, li gelê xwe yê welatparêz û dostên xwe yên demokrat pîroz kir û got: "Em hemû şehîdên xwe yên leheng ên ku bi şoreşgerê mezin ê enternasyonalîst rêheval Hakî Karer dest pê kir û heta şehîdên berxwedana Zap, Avaşîn û Metînayê em hemû şehîdên xwe, bi rêzdarî, hezkirin û minetdarî bi bîr tînin. Em soza xwe dubare dikin ku em ê bigihîjin armancên wan û bîranînên wan zindî bihêlin. Em ji hemû kesên ku di salvegera 45'emîn PKK'ê de ji bo azadî û demokrasiyê têdikoşin re, serkeftinê dixwazin".

'Navê PKK'ê bûye hevwateya Kurdayetî û Kurdistanê'

PKK'ê da xuyakirin ku PKK Partiya Rêbertî û şehîdan e û wiha got: "44 sal in di dîroka mirovahiyê de yek ji têkoşîna azadiyê ya herî mezin û bi wate daye meşandin. Li dijî dewleta Tirk a faşîst, mêtinger û qirker û pergala moderniteya kapîtalîst a cîhanî, vejîn û jinûvezayîna gelê Kurd pêk anî. Bi têkoşîna azadiyê ya pîroz a ku bi pêşengiya Rêber Apo û li ser bingeha hêza gelê me li ser xeta fedaîbûnê de pêş xistiye feraset û pergala mêtinger û qirker şikandiye. Her kêlî, roj, meh û sal bi têkoşînek ji ya berê dijwartir û serkeftîtir rêya rizgariya hemû gelan û bindestan bi taybetî jin û ciwanan ronî kiriye.

'Berxwedana mezin a gerîla mohra xwe li sala 44'an da'

PKK da zanîn ku têkoşîna sala 44'an a PKK'ê di heman demê de bû saleke têkoşînê ya ku salên berê derbas kir û layiqî rûmeta berxwedanê ya PKK'ê ye û wiha dewam kir: "Eşkere ye ku berxwedana mezin a gerîla ya li ser esasê Berxwedana Îmraliyê ya dîrokî û berxwedanên Zap, Avaşîn û Metînayê mohra xwe li sala 44'an da. Gelê me û dostên me yên welatparêz, li dora Rêber Apo û hêzên me yên leheng ên gerîla bûne yek, li dijî êrişên hovane yên faşîzma AKP-MHP'ê ya ku bi hemû rêbaz û alavan êrişan dike, li ser armanca azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têkoşîneke lehengî dane meşandin. Ev berxwedana dîrokî ya ku têkoşîna me ya azadiyê ya 44 salan biriye asta jor, bi şikandina êrişên dagirkeriyê yên AKP-MHP'ê û têkbirina planên wan ên îmhayê, derfet û firsendên bidestxistina serkeftinên mezintir radestî sala têkoşîna xwe ya 45'an dike."

'Gerîlayên HPG û YJA-Star li Zap, Avaşîn û Metîna destanên lehengiyê nivîsandin'

PKK diyar kir ku wê di sala 45'emîn de serkeftinên herî watedar bên bidest xistin û wiha domand: "Bêguman gerîlayên HPG û YJA-Star ku li Zap, Avaşîn û Metîna destanên lehengiyê nivîsandin, wê têkoşîneke wiha bi rê ve bibin. Yên ku 6 salan li Herêmên Parastinê yên Medyayê û 7 mehan jî li Zap, Avaşîn û Metîna dibêjin 'Em rê nadin dagirkeriyê' wê karibin têkoşîna ku dagirkeran bişkînin, pêk bînin. Zap, Avaşîn û Metîna wê bibe cihê ku dilê gelê me û mirovayetiya azad li wir lê dide. Feraset û siyaseta faşîst û qirker wê li Zap, Avaşîn û Metîna bê hilweşandin, çerxa azadiyê ya dîrokê li vê qadê wê bigere. Li ser vê bingehê em careke din berxwedana gerîla ya leheng silav dikin û bang li hemû gelê xwe û dostên xwe dikin ku li dora berxwedana gerîla bibin yek"

PKK da zanîn ku Jinên li çar aliyê cîhanê bi taybetî jinên Kurd bi rojan e li ber xwe didin û dadikevin qadan û tundiya dewleta mêr protesto dikin û wiha got: "Weke li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, li çar aliyên cîhanê jin bi dirûşma 'Jin Jîyan Azadî' ber bi azadiyê ve dimeşin. Em PKK em van çalakiyên azadiyê yên li dijî zîhniyet û siyaseta serdest a mêr silav dikin. Em di wê baweriyê de ne ku çalakiyên azadiyê yên jinan roj bi roj mezintir dibin û dibin şoreşa azadiya jinê û sedsala 21'ê dikin sedsala jinan. Partiya me ku bi fikra Rêber Apo ya jineolojiyê ve girêdayî ye, her tim ji hemû rêhevalên jin ên ji bo azadiyê têdikoşin re serketinên mezin dixwazin".

'Wê sala 45'an a PKK'ê bibe sala serkeftineke mezin'

PKK da xuyakirin ku eşkere ye ku sala 45'emîn a PKK'ê saleke pir krîtîk e û karibe qederê diyar bike û wiha got: "Faşîzma AKP-MHP'ê ji bo desthilatdariyê, dewleta Tirk jî ji bo bijî bi hemû hêza xwe êrişan dike û wê hê zêdetir êrişan bike. Li hemberî van hemû êrişan gelê me û dostên me wê di bin pêşengiya partiya me de zêdetir bibin yek û berxwedana herî mezin a dîroka xwe pêş bixin. Hêzên me yên leheng ên gerîla, rêxistinên jin û ciwanan, gelê me yê li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat, wê sala 45'an a PKK'ê bikin sala serkeftineke mezin û bikin sala azadiya fîzîkî ya Rêber Apo".



## 2 rojên li Fîsê

Farûk SAKIK

Di sala 1978'an de Rêber Apo li Amedê bû. Ger û civînê welat bi dawî bûbûn û hatibû Amedê. Li apartmana Gunaydin bi cîh bûbû.

Manîfestoya partîbûnê dinivîsî. Di germehiya tîrmeha sala 1978'an de Rêber Apo di 3-4 rojan de 140 rûpelên defterê nivîsîbû. Pirtûka 'riya şoreşa Kurdistanê' hatibû temamkirin.

Hin hevalên wî wek Dûran Kalkan, Mazlum Dogan û Cemîl Bayik dihatin vê apartmanê û bi Ocalan re îstîşare û amadekariya kongreya damezirandina partiyê dikirin.

Lê li cîhek bi ewle û li demek di wext de digeriyan.

Dema ku ev lêgerîna wan dewam dikir, Gundê Fîsê û mala Seyfettîn Zogurlu hat bîra Duran Kalkan.

Duran Kalkan di avakirina wê malê de alîkarî dabû Seyfettîn.

Dema ku ji Ocalan re behsa vî gundî û vî malî kirin, erê kir. Bangî hin kadroyên navendî wek delege kir ku werin tevlî civînê bibin. Bi tenê Kemal Pîr di zindanê de bû û Mehmet Karasungur jî li Hîlwanê amadekariya şer dikir nehatin civînê.

27'ê Mijdarê wek roja kongreyê destnîşan kirin.

Seyfettîn Zogurlu dayika xwe agahdar kir ku mêvanên wî hene bila amadekariyan bike. Hejmara mêvana gelek zêde ne.

Dayika Îsmet fahm kir, gazî qîz û bûkê xwe kir. Xwarin hat çêkirin. 3 eloq hatin şerjêkirin. Li kêlekê jî birinc hat çêkirin û li benda mêvanan ma.

Û ew mêvanên ku li bendê bûn êvara 26'ê mijdarê dest bihatinê kirin.

Rêber Apo dema ku ji Amedê bi rê ket li kêleka wî Cemîl Bayik, Sakîne Cansiz û Kesîre hebûn. Li taksiyek siwar bûbûn û berê xwe dane wî cîhê wê di dîroka Kurdan de bibe navendek pîroz.

Rojek payizê û mij û baran hebû. Êvarê dema ku gihîştin gundê Fîsê, Duran Kalkan û Seyfettîn Zogurlu wan pêşwazî kirin. Herdu jî berê hatibûn gund û ji bo vê roja dîrokî amadekarî kiribûn.

Malbat jî di nav amadekariyek de bû. Xwarin dihat çêkirin û ji bo ewlekariyê hin kes hatibûn erkdarkirin. Zekî û Alaattîn Zogurlu ji bo cîwan bûn û nobedara ewlekariyê ew hatibûn erkdarkirin..

Ji her heremê 2 delege hatibûn. Ji Dersim ,Çêwlik, Amed, Dîlok, Riha, Mêrdîn, Batman ji Elezîz jî 3 delege tevlî kongrê bûbûn.

Delegeyên ku tevlî civînê bûbûn bi roj dernediketin derve bi tenî di saetên şevê de derdiketin spor dikirin.

Civîn 2 rojan dewam kir. Gelek nîqaşên mezin çêbûn. Bername û pêşnûmeya partiyê hat qebûlkirin. Dîsa di vê civînê de rêvebirî hat hilbijartin. Di vê civînê de ji aliyê delegeyên kongreyê ve biryara partîbûnê hat dayin.

Kongre bi dawî bûbû partî hatibû damezirandin, lê ji bo ewlekariyê û dewlet bi ser wan de neçe demek ev biryara partîbûnê nehat îlankirin. Navê partiyê jî nehat destnîşankirin.

Piştî ku Rêber Apo ji kongreya Fîsê derket, li Amedê dest bi nivîsanadina "danezana damezrandinê" kir.

Ew danezan hat nivîsandin. Di nav gel de birêxistinê dest pê kir. Li Sîwereg û Hîlwanê şerê çekdarî dest pê kir. Ji bo gerîlatiyê amadekarî hebûn, lê bi encam nebû. 12'ê Îlonê darbeya leşkerî çêbû. Li zîndana berxwedan û 15'ê Tebaxê şerê çekdarî dest pê kir. Kurd bi kurdbûna xwe şiyar bûn. Cîwan ji her deverî tevlî nav refên gerîla dibûn. Ji bo azadiya Kurdistan têkoşînê dest pê kir. Komplo pêkanîn lê dîsa nikaribûn pêşî li vê têkoşînê bigirin. Li herêma Rojavayê Kurdistan şoreş pêk hat. Kurd û gelên herêmê di bin paradîgmaya Rêber Apo de rêveberiya xweser a demokratîk îlan kirin.

Lê dijminê kurdan nesekinîn. Dewleta Tirk a dagirker îro jî dîsa êrişên xwe yên dagirkeriyê dayî destpêkirin.

Li hemberî van êrişan kurd jî bi hêza 27'ê Mijdarê li ber xwe didin. Bi wî rih û vîna ku 27'ê Mijdarê hat afirandin, bersiv didin êrişên dagirkeriyê.

## TI ÊRIŞ NIKARIN TÊKÇÛYÎN Û HOVÎTIYA ERDOXAN VEŞÊRIN

SOZDAR DEMÎR



Dewleta Tirk a dagirker her ku diçe êrişên xwe li ser herêmê zêde dike. Dewleta Tirk gelek herêmên Sûriyê dagirkiriye û pêre jî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî, di van êrişên hovane yên dewleta Tirk de bi sedan kes hatin kuştin û bi hezaran kes jî hatin revandin û koçber kirin. Dewleta Tirk di her êrişên xwe yên li ser Rojavayê Kurdistanê de kesên ku pêşengtî ji şoreşa Rojavayê Kurdistanê re kirine dikin hedef. Dewleta Tirk herî dawî li Dêrikê komkujiyek pêk anî û di encama vê komkujiyê de 11 welatî şehîd û gelek kes jî birîndar bûn. Yek ji wan şehîdan jî hevalê me yê rojnamevan Îsam Ebdulahe ku dema şopandina êrişên li ser gundê Teqil Beqil ê Dêrikêde de gihişt asta şahadetê. Lê li beranberî van êrişên dewleta Tirk ti dewletên cîhanê helwestek tund nehat nîşandan, lê beranberî wê ji aliyê NATO ve tê destek dayîn, heger ku dewletên dunyayê ji vê hovîtiyê re nebêje bese û çavên xwe jêre bigre ew jî dibe hevkarê vî sûcî.

Dewleta Tirk ji Til Rifet, Şehba bigre heta Kobanê û Dêrikê êrişên xwe berfirehtir kir êdî rojana hermên bakur û Rojhilatê Sûrî topbaran dike, ev êriş û topbaran bi destekdayîna Rûsya û Amerîka pêk tê. Amerîka ji roja roj de alikariya Tirkiyê ji bo êrişên li ser Kurdan dike û bi rokêtên Amerîkayê êrişî Kurdan dike bi taybet Başûr û Rojavayê Kurdistanê, êrişên herî dawî ên li ser Kobanê parçeyên ji çekên giran ên bombebarana dewleta Tirk de ev vekirî derket holê ku bombeyên ku hetîn bikaranîn ên Amerîkane.

Dewleta Tirk ruxmî ku li çiyayên azadiyê ku li beranberî berxwedana gerîlayên azadiyê ku çekên herî pêşketî bikar tîne lê dîsa jî biser neket û her carê li beranberî berxwedana dîrokî ya gerîlayan binkeftinê jiyan dike, dewleta Tirk dewletek ewqas bê exlaqe ku cenazeyên leşkerên xwe benzîn lê kir û şewitandin. Li beranberî van çekên qedexekirî ji herçar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat dengek pir mezin derket û bi yek dengî gel rabûn ser piyan û ji dewleta Tirk a dagirker re gotin êdî bese. Ji bona ku van rewşan hemûyan bide guhertin seneryoyek çêkirin lê ev senarya di destê wan de teqiya ji bo vê rojevê zûtir bigûherînin êvara 19'ê mehê êrişî Bakûr û rojhilatê Sûriyê kirin.

Civaka Tirkiye jî êdi dizane ev desthilatdarî têk diçe û xwe bi derewan li ser piyan girtiye heger ku NATO ne piştevanê Tirkiye bûya niha zude hilweşiyabû lê yaku wê li ser piyan digre NATO ye.

Erdogan bi van êrişên xwe yên li ser herêmên bakur û Rojhilatê Suriyê û herêmên Parastinê yên Medyayê re dixwaze kêm zêde nakokiyên di nav xwe de veşêre, lê wê demekê were veşartin, lê di nêrîna min de wê demkî be bi hêrs û kîna gelê bakur û rojhilatê Sûriyê wê ev lîstikên wan hemû têk herin û projeya netewa demokratîk û xwişk û biratiya gelan wê bi ser bikeve. Wê ti êriş nikaribe têkçûyîn û hovîtiya Erdoxan veşêre.



# Dayîkên Şehîdan yên Efrînê : Tu hêz nikarê Tevgera Azadiyê tune bike

Dayîkên Şehîdan yên Efrînê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser qadên Parastinê yên Medya bi tundî Şermezar kirin û gotin, vîna Gerîlayên Azadiyê tu carî têk naçe.

**Zana Roj/ Şehba**

Hovîtiya dewleta tirk a dagirker ya li ser gelê Kurd bi sedê salan dewam dike. Ji destpêka damezrandina Partiya Kerkerên Kurdistanê PKK`e ve, dewleta Tirk ya faşîst bênavber êrişî wê dike. Dagirkerî ji bo tunekirina felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û têkbirina têkoşîna gerîlayên azadiyê, Tevayiya polîtîkeyên qirkirin û pişaftinê li ser gelê Kurd dide meşandin. Li hemberî hovîtiya dagirkeriya Tirê asta berxwedana gel û gerîlayan her roj zêdetir dibe, lewra jî ev 50 salin ku Tevgera Azadiya Kurdistanê her diçe berfirehtir û xurtir dibe. Ji ber ku dagirkeriya Tirk xwe li hemberî têkoşîna gerîla nagire û derbên giran dixwe, êrişên xwe yên bi çekê kîmyawî zêde dike. Di 17 ê cotmeha 2022'an de dagirkeriyê bi çekên kîmyawî êrişî Herêmên Parastinê yên MEDYA kir û di encama wê hovîtiyê de 17 qehreman hatin Şehîdxistin, ev ne cara yekê ye ku dagirkeriya Tirk li himberî qadên gerîla çekên kîmyawî bikar tîne, lê tevayî cîhan xwe bêdeng dike.

Dayikên Şehîdan yên herêma Efrînê bikaranîna çekên kîmyawî ji aliyê dagirkeriya Tirk ve bi tundî şermezar kirin û diyar kirin ku wê tu carî gerîlayên azadiyê tune nebin.

Dayika bi navê Zozan Reşîd diyar kir ku siyaseta qirkirinê ya dewleta Tirk a dagirker ya li hemberî gelê Kurd ji çiyayên azad dest pê dike û wiha got: "Ji despêka damezrandina Tevgera Azadiya Kurdistanê ya Apoyî ve, dagirkeriya Tirk bi tevayiya rêbazên qirêj êrişî wê dike. Dagirkeriya Tirk bi dehê salan êrişî Kurdan dike û gelek Kumkujî pêk anîn e. Ji dema desthilatdariya Osmaniyan heya niha komkojî dewam dikin. Ji geliyê Zîlan û Botanê bigire heyanî vê kêliyê, Komkujiyên wan bênavber didomin."



Zozan Reşîd da xuyakirin ku ev komkûjiyên li Herêmên Parastinê yên MEDYA tên kirin, bi alîkariya PDK`ê ye û wiha domand: "Ev hovîtî û êrîşên ku li ser çiyayên Kurdistanê de tên kirin, helbet ne ji rêzê ne, derbasbûna artêşa Tirkan di deverek wisa re, ji me re diyar dike ku ev derbasbûn û meşrûîyeta ku li wir pê tev digerin di encama lihevkirinek bi PDK'ê re tên kirin. Di vir de xeta îxaneta malbata Berzanî kes nikare înkar bike, bi salane ku piştgiriyê dide dijminê Kurdan ji bo ku serweriya xwe li ser Kurdistanê bike, bi vê yekê diyar dibe ku dewleta Tirk a dagirker ji bo têkbirina fikrê Rêber Ocalan, xwefiroşên mîna malbata Berzanî qebûl dike û wan ji bo qirkirina Kurdan bikar tîne."





'Gerîla hêza me a yekemîn e'

Dayiaka bi navê Fîdan Mihemed jî diyar kir ku gerîla hêza gelê Kurd ya zadiyê ya yekemîne wiha got: "Hêza gerîla parstvanên xeta fikrê Rêber Ocalan e, piratîk kirina vê fikrê û parastina destkeftiyên vê partiyê bi desê hêzên Gerîla tên kirin, ji ber vê jî bi salane ku vê xetê berxwedanî û têkoşîna azadiyê dide meşandin, ne dewletên navnetewî û ne jî dagirkeriya Tirkiyê dikare Tevgera Azadiyê tune bike, ji ber gerîla bi hêza xwe ya îdeolojîk û taktîkî tevdigere, di encama vê yekê de ji 50 salî û heyanî niha derbeyên pir giran li dagirkeran dide".

Fîdan Mihemed tekez kir ku gelê Kurd wê her tim piştevaniya hêzên xwe bike û wiha got: "Gerîla parstvanên rûmeta me ne, ger çi dibe bila bibe divê em bawer bin ku ev hêz wê neyê şikestin, em gelê mîrasê şehîda û xeta Rêbertî ne ji bo vê jî em banga tu cihî nakin, baweriya me bi îrade û hêza me ya li serî çiya heye, bila her kes bizanibe gel li pişta Gerîla ye ger yek destdirêjî li ser çiya bê kirin wê bi deh hezaran gel rabe ser piyan û bersîvên tund bide dagirkeran".

## Esas dijminê gelan, aqilmendê Tirkiyê NATO`ye

Memed Serdar



Dîroka tekoşîna azadiya Kurdistan de gelek caran pêvajoyên pir girîng biqasî girîngîyê xwe jî xeter hatiye jiyankirin. Gelek caran weke gel û tevger em pir nîzîkî serkeftinê bûne û pir caran dewleta dagirker ya Tirkan jî vê yekê mikûrhatiye. Destpêka salên 90`î rewşa şer û tekoşînê gîhîştîbû asteke wiha ku fermandarên artêşa dagirker îtîraf dikirin digotin ``biroj em desthilatdarin bişev gerîlla.`` Ev rewşa tewazina siyasî û leşkerî bi mûdaxaleyeke jor hate gûhertin, wê demê bi şewitandina hezaran gûnd û qetilkirina nîzîkî 20 hezar welatparêz hat gûhertin. Piştî pêvajoyên aşîtî û tekoşînên giran herî dawî pêvajoya çareserî ya sîyasî cardin heman destê jor mûdaxele kir û pêvajoya aşîtî bi provakasyonek vala hate derxistin. Dijminatiya dewleta dagirker ya Tirkan hember gelê Kurd bê nîqaş hemû cîhan dizane û nûmûneyên pêkanînên faşîstê Tirkan pir zêdene. Lê wekî ku hemû çavdêrên siyasî vê rastiyê dizanin û qebul dikin, dewleta dagirker ya Tirkan bi îmkan û derfetê xwe hember gelê Kurd şer kiriba heta niha 10 caran tasfiye buyî bu. Vê rastiyê carna rêveberiyê Tirkîyê jî îtîraf kiriye û rêveberiyê NATO jî li xwe mikûrhatine gotine ``Dewleta dagirker ya Tirkiye endamê NATO ye erîşê ser Tirkiyê em li ser xwe qebûl dikin.`` yanî wateya gotinên berdevkên NATO ``em weke NATO hember gelê Kurd şer dikin û hemû alîyande alîkariyê çek û cebilxane û lojîstîk û îstîxbaratê didin Tirkiyê.``

Her çikas ev daxwuyaniyên NATO herkes bîhîstî be jî cardin serîde gelê Kurd û siyasetmedarên Kurd û her wiha şoreşgerên Kurd rasterast NATO weke dijminê gelê xwe neditine û hember NATO peyveke hişk jî negotine. Lê di her civîneke NATO`ê de yê ku herî zêde dilê şefê faşîst Erdogan rehet dike axaftinên berdefkê NATO ye. Di her firsendê de dibêjin ``Erîş li ser Tirkiyê hene fikarên vê yên ewlehiyê hene, em wate didin tevgerên vê.`` Ev NATO`ê ku fikarên ewlehiyê ya Tirkiyê fêm dike û wate dide, heta niha carek tenê bi komî ji qetlîamê derbasbûna Kurdan re wate nedaye. Fikarên Kurdan yê ji bo xwe ji bin jenosaydê xelas bikin di cîhde nedîtiye. Li gor NATO gelê Kurd mafê herî tabîî ya jiyanê ji bo gelê Kurd ne pêwîste, lê ji bo dewleta dagirker ya Tirkan mafê dagirkirina axa welateke din û gûhertina demografiya geleke din di cih de ye.

Gelek caran rêberê gelan Rêber Apo di dahûrandinên xwe de vê rastiyê tespît kiribû ku şer di weteya xwe ya rastî de şerî bîrdoziye. Weke şer û tekoşîna bîrdozî em gelê Kurd û tevgera azadiya Kurdistan ji 27`ê Mijdarê 78 heta niha ev 44 salin hember bîrdoziya paradîgmaya moderníteya kapîtalist û zihniyeta dewletî şer dikin. Hember bîrdoziya moderníteya kapîtalist vê dema derbasbûyî ya 44 salande em weke gel û tevger bedîlek û alternatîfek mezin avakiriye.

Dema em bi perspektîfê bîrdozî li pirsgirêkê dinerin baştir tê dîtin ku dijminayiya NATO hember gelê Kurd encamê siyaseteke demkî nîne, bingehê dijminayî nakokiyên bîrdozîye. Ji ber ku li herêmê dewleta dagirker ya Tirkan berdevkiyê paradîgmaya moderníteya kapîtalîst dike di hemû aliyande alîkarî û piştgîriyê xwe ji bo Tirkan pêşkêş dikin. Dewleta dagirker ya Tirkan jî ji vê nakokiyê bîrdozî sûd jê werdigre û dixe bin xizmeta dijminayiyên xwe yê dîrokî. Di vê rewşêde dewleta dagirker ya Tirkan û hêzên dînamîk yê paradîgmaya moderníteya kapîtalîst her yek yê din ji bo armancên xwe yê demdirêj hevdû bikartînin, ev bikarhanîn tê hesabê herdû alîyan. Her wiha her dû jî hevdû bi pêşketin û destkeftiyên tevgera azadiya gelê Kurd tehdît dikin.

Em weke gel bi hemû gelên ku li herêmê jiyan dikin, rê û rêbazek peyda bikin bi şiklek sedîsed emê li hev werin. Çi pirsgirêkê me bi ti gelek re nîne. Em biratiyê gelan esas digrin, heqîqeta tevgerame û gelê me ev 44 sale wiha ye. Nîşaneyê vê gelekin û li ber çava ne. di serîde gelê Tirk û her wiha gelê din yên li herêmê jiyan dikin hemû vê rastiyê dizanin rojane dibin şahîd.

Lê ev kesayetên desthilatdarî meşandine û hêzên navnetevî ên weke NATO, pişt perdê de faşîstên Tirkan ji bo qetlîamên hîn mezintir bike tehrîk dike û hemû hewldanên çareseriyê bi mûdaxeleyên provakasyon xirab dike, divê vaya baş zanibin ku dema wan jî kêm maye. Li Tirkiyê şefê faşîst Erdogan dema li ser desthilatdarî ket wî demê helwestê gelan û derziyên bîrdozî hemû vegerin li ser wan. Gelê Kurd ne ew gelê berê yê saf û apolîtîk e, edî hûn nikarin bixapînin, gelê me baş fêm kiriye ku dijminê yekem dewleta dagirker ya Tirkane lê ya ji wî xirabtir jî, yê kû pişt perdêde wî îdare dike û berdide ser gelan saziyên weke NATO`ye, di encamde kîn û nefreta gelan hemû bizîvire li ser wan.